# Em li dijî şideta dewleta mêrane li ber xwe didin,
# Em ê bi ser kevin!

Bi sond û ehd, em ê desthilatdariya we hilweşînin.
Em ê li şûna wê jiyaneke azad, wekhev  û bêşidet ava bikin.

Di OHALê û di Her HALê de, em ji rabirdûyê ta dahatûyê,
her bo azadiya jinê li ber xwe didin.
Di OHALê de jin jî hatin qetilkirin. Di OHALê de jin jî ji kar hatin avêtin.
Qeyûm li 29 şaredariyan hatin tayînkirin, 25 hevserokên jin ji wezîfeyê hatin dûrxistin, jê 24 kes hatin girtin.
10 saziyên jinê hatin girtin.
5 parlementerên jin wek rehîne hatin girtin. Hevseroka Giştî ya Jin a li Tirkiyeyê tekane bû,
wek rehîne hate girtin.

Em li Geziyê jinên dêresor in, li Amedê li ber TOMAyan û li TEDÎyê jinên karker ên berxwedêr in û li Yeşîl Yolê Havva ne. Em li Parka Romayê, ew jin in ku xwedî li mîrasa dîrokî derdikevin. Em ew jin in ku li saziyên xwe yên ku we mohr li ser xistine, palpiştî û piştevaniya xwe xurt dikin. Em ew jin in ku li Polonyayê li dijî qedexekirina kurtajê li ber xwe didin û li Îslandê dibêjin “karê yeksan, destheqê yeksan”. Em ew jin in ku li Sûriyeyê ji bo pêkvejiyaneke  bi rûmet û wekhev li dijî dagirkeriyê li ber xwe didin.  Em li Şingalê li dijî hovîtiya DAIŞê têdikoşin. Em ew jin in ku li Rojava aktorên “şoreşa jinê” ne.

Em Ayşegul Terzî ne, Taybet Înan in, Yasemîn Çakal û Mamosta Ayşe ne. Em Gultan Kişanak in, Ayla Akat in, Fîgen Yuksekdag in. Sêvê ne, Pakîze ne Fatma ne. Em Sevda Çagdaş û Eylem Ataş in. Em Arîn Mirxan in. Em ew jin in ku li kolanan, li otobûs û meclis û li mal û zanîngehan; bi şev û roj her li ber xwe didin.

Baweriya me bi rêhevaltî û piştevanî û berxwedan û
îradeya jinê heye.
Em li vir in!

• Ji bo xwedîderketina ked û beden û îrade û nasnameya xwe,
• Ji bo aştî û jiyaneke nû û li dijî polîtîkayên şerr û qirkirinê,
• Ji bo mafê beşdarbûna siyaseta demokratîk û temsîla yeksan,
• Ji bo têkbirina jinkujî û qetilkirina ji nefretê,
• Ji bo xwedîderketina saziyên xwe yên demokratîk,
• Ji bo karê yeksan û destheqê yeksan,
• Ji bo têkbirina karê bênîzam û bêtemînat,
• Ji bo hevparkirina  xwedîkirina zarokan û karê navmalî û bo vekirina zarokxaneyên bêpere li tax û li kargehan,
• Ji bo vekirina jîngehên azad ên ku di rewşên tûndûtûjiyê de em bikaribin xwe bispêrinê,
• Ji bo makezagoneke jinane,
• Ji bo têkbirina tawanên karî,
• Ji bo dabînkirina mafên ewlehiya civakî ya ku li ser esasên wekheviyê ava bûyî û keda navmalî piştguh nake ya jinên ku ji bilî navmalê ti karî nakin û hemû jinan,
• Ji bo budceyeke yeksanîxwaziya cinsî ya li mal û dibistan û bazar û market û şaredarî û meclis û medya û kolan û zeviyan û li dijî şerr,
• Ji bo jinên nivîşkan, jiyaneke birêkûpêk,
• Ji bo têkoşîna li dijî polîtîkayên ku bedena me biryara me û dixe bin hikmê xwe,
• Ji bo bidestxistina mafê kurtajê,
• Ji bo têkoşîna li dijî perwerdeya cudaker û zayendperest,
• Ji bo xizmeta tendurustiya bi zimanê zikmakî û ya bêpere, wekhev , baş û berdest,
• Ji bo welatekî azad ne welatekî bindest,
Em di 25ê Mijdarê de li qadan in!

Em jin in, li vir û li her derê ne! Hêza me piştevaniya me û hêvî û yekîtiya me ye!

Em ê hemû astengî û şidet û reîstiya we hilweşînin! Em berxwedan in û siberoj dê ya me be!

**#NeReîstîWekhevîHeye**

MECLISA JINÊ ya HDPÊ

MECLISA JINÊ ya HDKÊ